

Dr. Ekrem Önen  
ekremonen@hotmail.com

## Medya Kurdî di internetê de

Gotina “civata înfomasyonî” di salên 1960 wek termînolojîyek nuh hate rojewê. Ev termînolojî jiber transformasyona di civakê de bû bi kar hate anîn. Ev termîn her weha bi awayên dinjî bi kar hate anîn wek “civata postîndustrîal”, “civata zanistî”, “civata superîndustrîal”, “civata pêla sisya” û her weha bi çend awayên din jî bi kar tê.

Teknîka înfomasyon-komunikasyonê grîngtîrîn rol di transformasyona civatê de lîst. Heger mirov pêşketina civatê bike sê qonax wek “civata feodal”, “civata îndustrî” û “postîndustrî” an bi awayekî din civaka înfomasyonî.. Heger mirov bi kurtî bixwaze bê civata înfomasyonî çîye mirov dikare bi vî awayî bêje civaka ku ji intaca (ûretim) tiştan derbasî civata ku xizmetê pêşkeş dike wek xwendin, tenduristi, lêkolîn û îdarî. Bi vê guhertinê guhertin di struktûra civatê de jî çê dibe, hejmara kesên întelektual, profesîonal (miroven Teknîk) zêde dibe, her weha di vê civatê de giraniyê dide zanebûna teorîk û înfomasyonê. Heger mirov di ware înfomasyonê li şaristaniya mirovayetîye binere mirov wê jî dikare bike sê merhale di merhala pêşî ya feodalî de înfomasyon di rêya odê civatan, bazaran, klîsan, mizgeftan de belav dibû di qonaxa dudan de înfomasyon di rêya teknîka intaca (ûretim) civakî wek gazete, kovar, sînema, radîo û televîzyon, di konaxa sisyan de a postîndustrîal de înfomasyonê hudûdê navbera welatan ji ortê rakir û înfomasyon êdî dikare bighêja hemû tebeqê civatê û monopolîya înfomasyonê ji ortê radibe û înfomasyon dibe civakî. Ev hemû di rêya teknîka nuh kompyûter û internetê de dibe.


Ji alîkî din jî heger mirov qonaxên ku medya li welatekî têde derbas dibin binere mirov wê jî dikare bike sê beşan: medya partîfîyê, medya profesyonel, medya tîcarî (komersîal). Heger mirov li medya Kurdî binere mirovê bêje lazîme kurd jî di van merhalande derbas bûbin. Lê ev sê qonax li her welatekî di protsesek ne wek hev pêk te her welat li gor rewşa xwe ya aborî, sîyasî, civakî û her wekî din de derbas dibin.

Ji ber rewşa Kurdan ya teybet yanî bindestî û perçebûna welatê me sebebê asasiye ku heta nuha medya Kurd nakare ji qonaxa medya partîfîyê derbasî qonaxa dudu bibe her çuqasî van salên dawî êdî hêdî hêdî îşaretên ku medya kurd derbasî qonaxa dudu dibe mirov dibîne ev bê guman cihê kêf xweşîyêye. Li vir dixwazim bêjim ku rola medya partîfîyê di civat û tevgera netewî ya kurde cîhekî rêzê yî herî bilinde bi rehetî dâkarim bêjim medya kurdî ku nuha heye ev encamê tekoşîna partîyen Kurde. Lê li vir pirs ne eve pirs ewe ku qonaxnin hene lazîme mîlet ,civat têde derbas bibin em jî wek kurd lazîme di van qonaxan de derbas bibin em bixwazin nexwazin ev qonax wê pek bîn zû an dereng.

Îroj wek li hemû cîhanê çawa internet bi kar tê, li welatê me jî internet li gor pêşketina xwe bi kar tê. Di vê dema ku medya derbasî warê virtuel dibe li kurdîstanê jî medya kurdî internet ê hatîye avakirin. Bê guman tevî kêmayên xwe medya Kurd di internetê de rolek grîng di tevgera rizgarîya netewî de dileyze û ev rol her kû diçe xurt dibe. Lê bê guman di vê prosesê medya Kurdî a internetê hatîye sazkirinde gelek kêmayî jî di vî warî de hene. Ezê nuha behsa hneka ji vanan bikim.


Piştî ku Federasyona komelên Kurdîstan li swed, komela nivîskarên kurd li swêd û kitêbxaneyê kurdî li swed biryara panelekê bi munasebeta salvegera rojnamegerîya kurdî li darxin girtin û ji bo min pêşneyarî anîn ku wek debator beşdar bibim, min pêşneyara wan bi dilekî xweş qebul kir. Li ser vê yekê min dest bi lêkolînekê li ser 14 malperên Kurdî ê wek: Amîda Kurd, Amude Com, Avesta, Azadîya welat, Dengê Azad, Kulturname, Kurditanmedia, Nefel, Netkurd, Peyamnêr, Pukmedia, Rizgarî, Rojeva Kurd û Serxwext. Ji ber ku nuçeyên

azadiya welat bê tarîx bûn tarîx jî ji bo lêkolîna min gring bû min nakarî bû li ser Azadiya welat lêkolîn bikim. Min ev Lêkolîn bi metoda kontent-analîz çêkir ev metod bêhtir di warê zanîstî de bi kar tê û mirov dikare bi gelek awayi bi vê metodê lêkolînê bike. Ji bo lêkolîna xwe mîna sê heftê dawî (2009 0401 – 2009 04 22) ê 13 malperên kurdî bi kar anîye. Di van sê heftan de mîna heroj li her 13 malperan nerîye û bi metoda kontent-analîz lêkolîn li ser wan kirîye. Heger bi kurtî bêjim mîna her roj li malperan nerîye ku ka bê rojê çuqas nuçe, reportaj, întervyû, analîz, satîra, û wêne her weha min li jêderên înfomasyon û şeklê dana înfomasyonê nerî û ji encamê sê heftan ev grafîkên hun dibînin netîca vê lêkolînê ye. Vê grafîka jêrîn xûsûyetê janr di malperên Kurdî de dide rêdan û di virde pir êşkere dibe ku malperên kurdî bêhtirê wan granîyek mezin didin sîyasetê aliyên civakî, kultur, satîra gelek kêmin her weha reportaj û întervyû jî gelek kêmin.




Ev grafîka din a ku nuha li jêre qiyasa reportaj û întervyû di malperên kurdî de dide rêdan. her çuqas întervyû û reportaj beşekî grîng di rojnamegerîyê de ye lê encamê vê lêkolînê dide diyarkirin ev herdu janr jî di malperên kurdî de ne wek tê xwestin

## Qiyasa reportaj û întervyû di malperên kurdî de



Di vê grafîka dawî de jî hejama nûçeyên bi wêne di malperên kurdî de. Di dana nûçeyan bi wêne reşşa malperên Kurdî başe lê kêmayî di teknîka dana wêne de heye, gelek wêne ne diyare çuqas teesîrek pozîtîv li ser xwendevan di hêle.



li gor vê lêkolîne diyar kir problemek din ya medya kurdî di înternetê de ew ku problema sazkirina raya giştî û çêkirina rojevê ye.

Alîyekî serkeftî di malperên kurdî de jî ew ku di malperên kurdî de paparsi tuneye ew jî alî etikê de gelek grînge û ew jî jî ve lêkolînê hate diyarkîn ku malperê kurdî di vîrde de serkeftîne

Dî varê têkilîyên malpera bi xwendevnre rewşa malperan kurdî ne xerabe her ne di hemu malperan debe jî lê gelek malper di vî vwarî de başin wek di gelek malperan de gelek caran xwendevan li bin nûçeyê komantarîya xwe dinivîse ew yek jî forma têkilîyên bi xwendevan re ye.

Her weha min xwest ez lêkolînê li ser ku ka bê malperên kurdî berê xwe didin kîjan qîsmê civatê yanî ê li van malperan dinerîn temenê wan çendîn, lê min ev nakarî bû bikra ji ber ku karekî weha lazîme mirov di nava civatê de lêkolînekê bike ew jî ne di taqeta min debû. Lê ez dikarim di vî warî de tiştekî bêjim ku bêhtirîn malperên kurdî berê wan bi kesên temenê wan jî 30 û bi jordeye ev encam min jî nûçe, reportaj û intervyu yê di malperan de bun fêm kir. Heger mirov lê binere medya kurdî ya înternetê di demeke kinde gelek gaven baş xurt avêtine lê hîn gelek tiştên bê kirin hene di vî warî de Hêvîdarim wê medya kurdî ya înternetê wê di demên pêşmede gavên xurtir baveje ji bo karîbe bi erka medyak modern ve rabe.

P.S. Kek Eşref Okumuş û Newzad Elî jî debatorê panelê bûn  
Lorîn Berzincî Moderator bû

Jêder

- 1- Шкондин М.В. Система средств массовой информации. – М., 2002.
- 2- Система Средств Массовой Информации России Учебное пособие для вузов/Под ред. Я. Н. Засурского. -- М.: Аспект Пресс, 2001
- 3] См.: Засурский Я. Н. Закономерности и тенденции развития журналистики в переходный период//Журналистика в переходный период: проблемы и перспективы

- 4- Филлипс Дж. Управление проектами в области информационных технологий.
- 5- Таненбаум Э. Компьютерные сети. СПб: Питер. 2003.
- 6- Нильсен Я. 10 главных ошибок в веб-дизайне три года спустя. .
- 7- Круг С. Веб-дизайн, или Не заставляйте меня думать. – С.-Пб., 2001
- 8- Горный Е. Интернет для журналистов // Русский журнал
- 9- Гаврилова Т.А., Хорошевский В.Ф. Базы знаний интеллектуальных систем. СПб: Питер, 2000
- 10 Апджон Р., Раффин Х. Интернет и журналистика
- 11- Ричард Харрис. Психология массовых коммуникаций. М.: ОЛМА-ПРЕСС, 2002.
- 12- Березин В. М. Массовая коммуникация: сущность, каналы, действия. М.: РИП-холдинг, 2003
- 13- Basının Gücü Martin Walker çeviren. Gülден Şen
- 14- CIA dan medya ya kitlelerin kontrolü Jim Keith. Nokta yayıları
  
- 15- Malperên Kurdî: Amîda Kurd, Amude Com, Avesta, Azadîya welat, Dengê Azad, Kulturname, Kurdistanmedia, Nefel, Netkurd, Peyamnêr, Pukmedia, Rizgarî, Rojeva Kurd û Serxwest.